Ankara, hava sahasını Kürdistan Bölgesi'ne kapatarak Erbil ile Süleymaniye havalimanlarına uçuşları yasakladı. İran ise Kürdistan Bölgesi ile sınır kapılarını kapattı. 16 Ekim'de Kürdistan Yurtseverler Birliği'ne (YNK) bağlı bazı birliklerin çekilmesiyle Irak ordusu ile Haşdi Şabi güçleri başta Kerkük ve Tuzhurmatu olmak üzere Kürdistanî bölgelere ilerlemişti.

Söz konusu güçlerin bölgeye girmesiyle Kürtlerin yanı sıra referanduma destek veren Türkmen ve Arap aileler de evlerini terk etmek zorunda kalmıştı.

Nerina Azad

Bafıl Talabani: YNK tüm taraflara kardeşlik ve barış elini uzatıyor

YNK Başkanı Bafıl Talabani, "Milletimize hizmet edeceğiz, onların güvenliğini ve onurunu koruyacağız, Kürdistan'da birlik ve barışı koruyacağız. YNK tüm taraflara kardeşlik ve barış elini uzatıyor" dedi.

Başkanı Bafıl Talabani, Henarê Huner Kongre Salonu'nda gerçekleştirilen kongrede bir konuşma yaparak, tüm Irak ve Kürt güçleriyle ilişkileri güçlendirmeleri gerektiğini belirtti.



Talabani, "Önümüzde iki seçim var ve bir de kongre yapacağız. Bu YNK'nin gücünü gösteriyor. Biz birbirimize güveniyoruz. Bugün hep birlikte yeni bir döneme başlıyoruz. Milletimizi uzlaştırmalıyız. Partimizi daha sıkı bir birlik haline getirmeliyiz. Halkımız için her türlü fedakarlığı yapmaya hazır olmalıyız" ifadelerini kullandı.

Bafıl Talabani'nin konuşmasından öne çıkanlar şöyle: "Milletimize gerektiği gibi hizmet edebilmek, şehitlerimizin kanına saygı duyabilmek, Mam Celal'in yoluna sahip çıkabilmek, siyaset yapabilmek ve Mam Celal'in felsefesine göre yaşayabilmek için Kürdistan Yurtseverler Birliği'ni güçlendirmek için aynı ruhla burada toplandık. Mücadelecilerimizi, şehit ailelerimizi, siyasi cezaevlerimizi, engellilerimizi, Peşmegerelerimizi, dostlarımızı, milletimizi başımıza, gözümüze koyacağız.

Bugün hep birlikte yeni bir döneme başlıyoruz, milletimizi uzlaştırmalıyız, partimizi daha sıkı bir birlik haline getirmeliyiz, milletimiz için her türlü fedakarlığı yapmaya hazır olmalıyız. KYB tüm Kürt partilerine, eşitliğe ve birliğe inanan her partiye kardeşlik ve barış elini uzatmalı. Biz KYB olarak Bağdat'taki kardeşlerimizle ilişkilerimizi sürdürmeli ve güçlendirmeliyiz. Şiilerle el ele verelim. Sünni kardeşlerimiz, Hristiyan kardeşlerimiz... Birliğe hazır olan herkesi sahiplenmeli, kucaklamalıyız. Özgürlük ve demokrasi için mücadele edelim.

YNK, bu ekonomik krizin ortasında iki seçimden önce kongre yapacak kadar güçlü. Bu da birbirimize ne kadar güvendiğimizi, kadrolarımıza ne kadar güvendiğimizi, milletimize ne kadar güvendiğimizi gösteriyor. Özgürce yaşayabilmeli, fikirlerini korkusuzca ifade edebilmeli, kadınların ve azınlık topluluklarının haklarını savunmalıyız. Bu kongrede gençlere özel bir program hazırlamanızı rica ediyorum.

"Milletimize hizmet edeceğiz"

Kürdistan'ın petrolünün, doğalgazının olduğu doğru ama bizi asıl zenginleştiren şey, gökyüzünde yıldızlar gibi parlayan ve ne yazık ki hakkıyla hizmet edilemeyen gençlerimizdir. Tekrar edeceğim: Milletimize hizmet edeceğiz, onların güvenliğini ve onurunu koruyacağız, Kürdistan'da birlik ve barışı koruyacağız.

Sizlere hizmet etme fırsatını bana vermiş olmanız benim için büyük bir onurdur. Bu kongrede ne olursa olsun birlikte olacağız. El ele, omuz omuza. Bana hangi mevki ve rütbeyi vererseniz verin, sizi asla bırakmayacağım, rakiplerinizin ve düşmanlarınızın size hakim olmasına asla izin vermeyeceğime söz veriyorum. Biz Kürdistan Yurtseverler Birliği'yiz, biz mücadelecilerin ve şehitlerin partisiyiz, biz kahramanların partisiyiz, biz diktatörlüğü yıkanların partisiyiz."

Nerina Azad

Uluslararası Koalisyon'dan Rojava'daki üslere onlarca araçlık ağır silah sevkiyatı



Suriye İnsan Hakları Gözlemevi'nin (SOHR) bildirdiğine göre,

ABD liderliğindeki IŞİD Karşıtı Uluslararası Koalisyon Rojava'nın

Haseke kentinde bulunan üslere ağır silahlarında içinde olduğu 36 araçlık yeni bir askeri sevkiyat gerçekleştirdi.

SOHR, Uluslararası Koalisyon'un Rojava'nın Haseke kentinde bulunan üslere ağır silahlarında içinde olduğu yeni bir askeri sevkiyat gerçekleştirdiğini bildirdi. Haberde, Uluslararası Koalisyon Güçleri'nin, ağır silahlar, yakıt, lojistik ve askeri teçhizat taşıyan 36 kamyonluk bir konvoyun Kürdistan Bölgesi'nden gelerek El Velid sınır geçidi üzerinden Suriye topraklarından Rojava'nın Haseke kentindeki üslere doğru yola çıktığı belirtildi.

Nerina Azad

GELO ÇIMA SEROK Û RÊBERÊN KURDA HEV NAGIRIN NABIN YEK?

Tahir Silêman: Hevpeyvîn di gel nivîskar, rojnamevan, lêkolînêr, kurdzan welatparêz Bûbê Esera

-Tahir Silêman -Gelo çima serok û rêberên kurda hev nagirin nabin yek?

-Bûbê Eser: pirsek di cih de ye. Lê divê em vê yekê ji bîr nekin ku eva zêdeyî 300 salan e ku daxwaza yekitiyê ji kurdan tê xwestin, lê mixabin nabin yek.

Li gor min du sedemên vê yên serekî hene:

a- Welatê kurdan Kurdistanê şêrin di dema feodalîzmê (axatîyê) ya herî xurt de hate perçekirin. (1639) Loma jî axatîya di nava kurdan de xurt bû. Di perçekirina welêt de wan axana xwe parast û hê jî li ser wê yekê ne. Em baş dizanin ku axayên kurdan yek ji ber ê din danaxun. Loma jî nikarin bêne ba hev da ku yekitiya xwe çê bikin. Dema kurd ji hev perçebûn, ew bîr û baweriyê axatîyê di nava xwe da parastin. Ev parastin û ne guherîna kurdan kir ku kurd nebin yek.

b- ji ber ku kurd nebûne neteweyî loma jî berjewendiyên şexsî tim li pêş e. Dema berjewendiyên şexsî li pêş be wê gavê herkes ji bona xwe heye. Di rewşên weha de tenê ez û ez hene loma jî ew ez eza nahêle yekitiya Kurdan li ser hîmê netewebûnê pêk bê.

Berê axa bûn û her axayek serdestê gund û gundiyan xwe bûn. Niha jî rêxistinên me her yek ji wan bûne axa û tehamulîya partiyeke din nake. Heger bibin yek gelo kî yê bibe serok. Loma jî dibêjin bila ez serok bim û çend kesên ku pesnê min bidin hebin bes e. Ji ber vê ye ku kurd û rêxistinên kurdan nabin û nikarin bibin yek. Îro yekîtiya kurdan ji her gavê bêtir lazim e, lê dîsa em dibînin bêtir ji hev cûda dibin.

Ji ber hîsên neteweyî di nava kurdan û rêxistinên wan de qelse loma nikarin berjewendiyên xwe ê rêxistinî û şexsî bikin qurbana ya neteweyî. Loma jî heta ku kurd nebin neteweyî wê her pîrsa yekîtiyê jî di nava wan de hebe.

-Tahir Silêman - Çima PKK-e, PYD-ê naxwaze cenabî Mesud Barzanî Kurdistanê Serbixwe ava bike?

-Bûbê Eser: PKK û PYD ne ku naxwazin brêz Mesud Barzanî Kurdistanê serbixwe ragihîne. Sibê kes û kesayetiyeke din jî bixwaze kurdistanê serbixwe ragihîne wê pkk û pyd li dijî wî/ê jî derkev. Ji ber ku PKK û PYD ji bona kurd nebin xwedîyê xwe û kurdistanê serbixwe hatine damezrandin. Ne tenê serxwebûna kurdistanê ew heman demê li dijî hemû hêjayiyên kurdan e. Orf û adetên kurdan xerab kirin û dîkin. Zimanê kurdî (li bakur) têk birin. Bifikirin ku partiyeke ji bona azadiya welatekî (qaşo) hatibe damezrandin lê hemû perwerdayiyên xwe yên leşkerî bi tirkî dîkin.

Zimanê wan î serdest tirkî ye. Bi vê yekê hizir û hîsên kurdewarî ji kurdan dûr dixin. Dema tu bi zimanekî bipeyivî tu li gor wî zimanî şikil digire.

Em û ew jî baş dizanin ku helwestên brêz Mesud Barzanî helwestên neteweyî ne. Ew dixwaze xewna mîletê xwe ya bi salan bike rastî. Lê ev li hesabê pkk û pyd de nayî çima? Ji ber ku rişma wan di destê karbidestê gelê me de ye. Ew çî bixwazin pkk wê dike. Loma jî wê her li dijî serxwebûna kurdistanê rawestin. Mesele ne şexsî lê neteweyî ye.



Çi demê dewleteke kurdan ya serbixwe bê avakirin wê demê jî hemû tiştên pkk jî dê diyar û eşkere bibe ku kî wan îdare dike û heta niha kirine. Ji ber vê ye naxwazin kurd bibin xwedî dewleta xwe û dibêjin; "Me fikra dewletbûnê avêtîye çopê"

-Tahir Silêman - YNK û Goran bo çî berbi ereba Hukûmeta merkeziya Îraqê û Îranê direvin?

-Bûbê Eser: Ez bi xwe baş nizanîm çima ynk û goran berbi ereban û hukûmeta merkeziya iraq û îranê de direvin. Lê dikarin wê bêjim, Mînaka min di serî da tam jî li bejna wan jî tê. Heger em carekî li dîroka xwe û ya gelê xwe binêrin, em ê bibînin ku çî dema tekoşîna azadiya gel xurt bûye, aha di wê gavê de hin serok eşîr û axa li dijî wê derketine. Bi sedan mînakên vê hene. Ew axana ji bona weke axa her bîmîn, alîkariya dijmin kirine û dîkin. Bi sozên dijmin dixapin da weke axa bîmîn. Lê çî dema dijmin karê xwe bi wan qedandine çî hatiye serê wan diyar e.

Li gor min îro rewşa ynk û goran jî ev e. Ew dibînin ku serok Barzanî qedr û qîmeta wî di qada navneteweyî de gelekî bilind e. Piraniya kurdên herçar perçan gelekî bi wî bawer û jê hez dîkin. Ew jî her gav xwedîyê soza xwe û kurê bavê xwe ye.

Ji ber vê ye ku ynk û goran kar dîkin da ku rola serok Barza-

nî çî di qada navnetewî û jî di nava gel de qels bikin, tim bi dijmin re tevdigerin. Ji bona berjewendiyên xwe yên şexsî û rêxistinî xeyala kurdan ya dewletbûnê dixwazin bi destê dijmin têk bibin.

Îro ê ala kurdistanê serbixwe rakirîye serok Barzanîya loma vana jî dixwazin û kar dîkin da ku wî têk bibin. Bi vê têk bûnê wê kurdistanê serbixwe jî çê nebe ev jî li gor berjewendiyê dagirkeran e.

-Tahir Silêman -PKK-e dew û doza demokratîbuna hokumeta Tirkîyê dixwazin.



Gelo demokrîya Atatirk xencî tunnekirina kurda çî da kurda wekî demokratîya Erdoxan çî bide?

-Bûbê Eser: Tekoşîna gelê bindest ne ew e ku demokrasiyê ji bona dijminê xwe bîne. Tekoşin ew e ku gelê xwe azad bike û ji bona wî gelî dewleteke demokratîk damezrîne. Loma jî ew rêxistin, kes û kesayetiyan kurd yên ji bona demokrasiya tirkîyê kar dîkin, di eslê xwe de ew naxwazin kurd bibin xwedî dewlet. Armanca wan ew e ku kurdan bi dirûshmên derewîn bixapîne û kurdan di nava dijmin de bimehîne ango tune bike.

Heger em carekê dîroka Atatirkê tirkî bixwînin em ê bibînin ku ew dîrok li ser kuştin, qetilkirin û tunekerina kurdan hateye holê. Îcar kurdên ji bona demokrasiya Atatirk kar bikin ew bi eşkereyî dibe dijminê gelê xwe. Loma jî divê kurd xwe ji bratiya tirk û kurdan biparêzin. Divê baş bê zanîn ku kurd û tirk tu caran nabin bira. Karin bibin çîran li ne bra.

Heger em pîvanekê bikin, ji bona me kurdan dagirker her dagirker e. Yê baş û xerab tune ye. Ew dijminê gelê me ne. Loma jî anîna demokrasiya nava wan ne karê kurdan e. Kar û barê kurdan divê tenê ji bona azadiya wan be. Divê kurd berê di nava xwe de demokrat bin û ji bona anîna demokrasiyeke baş kar bikin.

Tu weke kurd xwe bi xwe ne li hev be, tu nikaribe tehamula

brayê xwe bike, tê çawa ji dijmin re demokrasiyê bîne gelo? Kurd divê ne li dijî şexsan bin, îro Erdogan e sibê yekî/a din, divê kurd li dijî sazûmana dewletê tekoşîna azadiya gelê xwe bide.

-Tahir Silêman - Bi siyaseta PKK-e 5000 gund û 10- bajar valabûn, gelo gunehê van bajar û gundan çî bu, heya kîngê kurdê koçber bibin?

-Bûbê Eser: Min berê gotibû dîsa dubare dikim. PKK ji bona kurdistan çê nebe ji teref dewleta tirk ve hatiye damezrandin. Ji ber vê yekê ku; Pkk Tirkan heye,

kingê Netewa Kurd wê bibe leyîskvanê dewletên dagirker?

-Bûbê Eser: Çi demê kes, kesateyî, partî û rêxistinên kurdan bibin neteweyî wê êdî neyên listika dijmin. Loma jî divê em berê ji bona vê kar bikin. Divê karê partî û rêxistinên me ew be ku hîs, bîr û baweriyên xurt yên neteweyî di nava xelkê de belav bikin. Lê ji ber ku ew bi xwe jî hê tam nebûna neteweyî loma jî ev hevîr wê hê gelek avê bikşîne.

-Tahir Silêman - Gelo çima rojnamevan û siyasatmedarên kurda kurdên Azerbaycanê û kurdên Sovêta berê pîrs nakin?

- Bûbê Eser: Tu rastî bixwaze divê mirov ji wan partî û rêxistinên ku pîrsa Siyasetmedarên kurdên Azerbaycanê nakin; bipirse. Ji ber ku camêran ango kurdên sovyeta berê û yên Azerbaycanê karên hêja kirine. Divê hemû kurd bibin pesindarê xebatên wan. LÊ çima pîrsa wan nakin ez nizanîm.

Ez dibêjim ne tenê pîrsa wan nake, pîrsa kurdên cîranê xwe, yên di mala xwe de jî nakin. Ji ber ku rêxistin û partiyan me di warê netewebûnê de qels in loma. Lê esil sedema vê ez jî bi xwe nizanîm divê mirov carekê ji wan bipirse.

-Tahir Silêman - Sazî û partîyên kurda li Avrupa û Bakurê , Başûrê Kurdistanê konfêrans û civîna derbas dîkin, çima kurdên Sovêta berê dewetî wan konfêransa nakin bo çî?

-Bûbê Eser: Bawerîya min ew e ku ev pîrs û ya 7an hema hema weke hev in. Çima bang nakin divê mirov ji wan bipirse. Weke min berê jî gotibû gelek caran kurd bi xwe bangî hin kurdan jî nakin. Bawerîya min ne mesela kurdên sovyeta berê û azarbeyanê ye. Pîrs pîrsa têgihiştin û bawerîya neteweyî ye. Piraniya kêmanîyan dibe, ji ber bi kurdan re bawerîya neteweyî kême loma.

-Tahir Silêman -Hun rojname "Diplomata kurd" çawa dibînin?

- Bûbê Eser: Rojnameya "Diplomata kurd" carekî baş dike û divê her li ser karê xwe berdewam be. Xwe ji karên yekalîyê dûr bixin ku niha weha ye. "Diplomata Kurd" jî îro dengê kurdî ye û divê ew deng her hebe. Loma divê kurdên me jî piştgirî û alîkariya wê bikin da ku bêtir karê baş derxin. Ez bi xwe hemû karê ku "Diplomata kurd" dike pîroz dikim. Ji te û wan re serketinê dixwazin. Gelek sipas bo ku we ev hevpeyîn bi min re çê kirin da ku ez jî bikaribim, nêrîn û dîtînen xwe bi xwendevanên "Diplomata Kurd" re parve bikim.

Her şad, bextewar û serketî bin. Zor spas bona hevpeyvînê

Tahir Silêman

-Tahir Silêman - Heya

Nêçîrvan Barzanî û şandeye Romanyayê tekezî li ser pêşxistina pêwendiyên dualî dikin

Serokê Herêma Kurdistanê îro pîncşemê 28.09.2023ê li Hewlêrê, pêşwaziya şandeye Senatoya Romanyayê ya bi Serokatiya Sen-



ator Titus Corlatean Serokê Komîteya Siyaseta Derve ya Senatoya Romanyayê kir. Şandeya Romanyayê ji hejmareke Senatoyan, Balyozê Romanyayê li Iraqê û diplomatkar û berpisê nivîsîngeha Konsulxaneyê wî welatî ya li Hewlêrê pêk hatibû.

Li gorî daxuyaniyeke malpera Serokatiya Herêma Kurdistanê, di hevdîtînê da her du aliyan tekezî li ser pêşxistina tîkiliyên di navbera Romanya û Iraq û Herêma Kurdistanê de kirin bi taybetî di warê aborî û perwerdeyê da û her wiha peywendiyên Hewlêr – Bexdayê û gotûbêjên çareseriyê wan pirs-girêkan gotûbêj kirin.

Nêçîrvan Barzanî amadehî, rol û beşdariya Romanyayê di Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê de bilind nîrxand û spasiya Romanyayê kir ku salên dirêj burs û derfetên xwendinê pêşkêşî xwendekarên Herêma Kurdistanê û Iraqê dike.

Ji aliyê xwe ve şandeya mîhvanê kîfxweşiyê xwe bi serdana xwe ya Hewlêrê nîşan da û tekezî li ser amadehî û daxwaza welatê xwe ya ji bo sarmayezandina li Herêma Kurdistanê kir, ji bo vî mebestê, derbarê niyeta hatina sektora taybet û çend kompaniyayên Romanyayê û mekanîzma karkirina wan li Herêma Kurdistan û Iraqê digel Serok Nêçîrvan Barzanî danustandina bîr û raman kirin. Rewşa navçeyê bi giştî û çendîn mijarên din yê xwedî di berjewendiyên hevbeş, çend mijarên din yê hevdîtînê bûn.

Nerina Azad

Mesrûr Barzanî bi Konsula Brîtanyayê re civiya

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî îro 25ê Îlonê li Hewlêrê, pêşwazî li Kon-



sula Giştî ya Brîtanya li Herêma Kurdistanê Rosy Cave kir ku ji bo xatirxwestinê ev serdan kir. Serokwezîr Mesrûr Barzanî, di civînê de bal kişand ser pêwendiyên dostane yê dîr û dirêj di navbera Herêma Kurdistanê û Brîtanyayê de û spasiya Konsula Giştî kir ku di heyama karê xwe de, kar ji bo pêşvebirin û bihêzkirina pêwendiyên dualî kir û hêviya serkeftinê di erkê wê yê paşerojê de jê re xwest. Herwiha Konsula Giştî ya Brîtanyayê jî kîfxweşiyaxwe ji bo hêsanî û hemahengiya aliyên peywendîdar ên Hikûmeta Herêma Kurdistanê ligel Konsulxaneyê welatê xwe nîşan da.

PeyamaKurd


Serok Barzanî pêşwazî li şandeye Parlamentoya Romaniyayê kir

Serok Mesûd Barzanî îro pêşwazî li şandeye pilebilind a Parlamentoya Romaniyayê bi serokatiya Serokê Komîteya Siyaseta Derve ya Parlamentoya Romaniyayê Senator Titus Corlatean kir.

Di hevdîtînê de ku birêz Balyozê Romanya yê li Iraqê Radu Octavian Dobre jî tê de amade bû, Serokê Komîteya Siyaseta Derve ya Parlamentoya Romaniyayê pesnê rola Serok Barzanî di tîkoşîna tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê de kir. Herwiha rol û qurbanîdana gelê Kurdistanê û hêzên Pêşmerge di şerê dijî terorîstan de bilind nîrxand.

Tekez kir jî, welatê wî giringiyê dide pêwendiyên xwe yê ligel Iraq û Herêma Kurdistanê û daxwaza pêşxistina pêwendiyên di navbera Romanya û Herêma Kurdistanê di warên kulturî, aborî, veberhênan û sektora taybet de kir.

Her di vî hevdîtînê de, Serok Barzanî pêwendiyên di navbera gelê Kurdistanê û gelê Romaniyayê de bi dostane binav kir û daxwaz kir ku ev pêwendî berfiretîr bibin, bi taybetî di



warên aborî, çandinî û veberhênanê de.

Her wiha Serok Barzanî spasiya rola Romaniyayê kir ku di şerê li dijî terorîstan de, di çarçoveya Hevpeymaniya Navdewletî de alîkariya hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê kir.

Di derbarê şerê dijî terorîstan de jî, Serok Barzanî tekezî li ser wê yekê ku metirsiya terorîstan metirsiyeke cihanî ye. Rast e DAIŞ di warê leşk-

erî de hatiye şikestin, lê hîn jî sedemên derketin û bihêzbûna DAIŞê berdewam in û bi pêwîstî jî zanî ku hevpeymanî û hewldanên navdewletî ji bo rûbirûbûn û jinavbirina terorê berdewam bin û di karê pêşîne yê siyaseta cihanê be. Herwiha rewşa siyasî ya Iraq û navçeyê û astengî û kêşeyên li pêşîya aramiya navçe û cihanê, mijarên din ên vî hevdîtînê bûn.

Nerina Azad

Mesrûr Barzanî: Dengê Kurdistanê platforma şoreşê, Pêşmergeyên qehreman û gelê Kurdistanê bû



Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Mesrûr Barzanî bi boneya 60 saliya damezrandina Dengê Kurdistanê peyameke pîrozbayî belav kir û tê de ragihandi, “Dengê Kurdistanê xwedî dîrokeke dirêj û hemû şanazî serwerî ye di

berevanîkirina li mafên rewa yê gelê Peyama pîrozbahiyê ya Cîgirê Serokê PDKê:

Rêvebir, stafa birêvebirinê û karmendên rêzdar ên Dengê Kurdistanê:

Bi boneya 60 saliya damezrandi-

na Dengê Kurdistanê, bi germî pîrozbahiyê li we dikim û hêviya pêşketin û berdewamiyê ji we re dixwazim.

Dengê Kurdistanê xwedî dîrokeke dirêj û hemû şanazî serwerî ye di berevanîkirina li mafên rewa yê gelê Kurd de û dengê resen, rasteqîne û sekoyeke rastgo ya şoreşê, Pêşmergeyên qehreman, gelê Kurdistanê û hemû azadîxwazan bû. Herwiha dibistanek ji bo perwerdekirina bi dehan rojnamevan, ragihandkar, kadro û serkirdeyên jêhatî bû.

Di vî boneyê de, bi rêz û pêzanîne ve hemû xebatkar û tîkoşerên ku di qonaxên cuda de li ser vî sekoyê xizmet kirine, bibîr tînin.

Destxweşiyê li we dikim û hêviya pêşkeftinê zêdetir ji we re dixwazim.

Mesrûr Barzanî

Cîgirê Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê

Parlamentera YSPyê: Li 7 gundên Wanê xwendekar nikarin biçin dibistanê

Parlamentera YSPyê di pêşniyarpîrsa xwe ya ji bo Wezîrê Perwerdeyê yê Tirkîyeyê de ragihand ku li 7 gundên Wanê bi sedan xwendekar ji ber nebûna servîsan naçin dibistanan.

Li Bakurê Kurdistanê ev zêdetirî 2 hefteyan e dibistan vebûne lê li hinek ji navçe û gundên parêzgehên Bakurê Kurdistanê xwendekar ji ber nebûna servîsan nikarin biçin dibistanan û bi mehan ji xwendinê dîr dimînin.

Parlamentera Wanê ya Partiya Çepên Kesk (YSP) Gulcan Kaçmaz Sayyîgîtê pîrsîrêka li çend gund û navçeyên Wana Bakurê Kurdistanê bir rojeva Parlamentoya Tirkîyeyê.

Sayyîgîtê di pêşniyarpîrsa xwe de ragihand ku li gundên Kirbali, Meydanli, Yanal, Tahil, Topluca, Orenkale û Yavuzlarê yê navçeya Elbakê ya



Wanê xwendekar ji ber nebûna servîsan nikarin biçin dibistanan.

Sayyîgîtê ji Wezîrê Perwerdeyê Yusuf Tekîn re got:

“Gelo hûn agahdar in ku li van 7 gundan bi sedan xwendekar naçin dibistanan?” “Xwendekar bi mehan naçin dibistanan” Gulcan Kaçmaz Sayyîgît diyar kir ku li Wanê perwerdeya bi rêya veguhestina xwendekaran êdî bûye pîrsîrêkeke kronîk

a cidî û got: “Li gelek gundan ji ber perwerdeya bi rêya veguhestinê xwendekar bi mehan naçin dibistanan. Bi girtina dibistanên gundan û nemana derfeta perwerdeya li cihê xwe re perwerdeya bi rêya veguhestinê bûye pîrsîrêkeke cidî.”

Parlamentera YSPê destnîşan kir ku bi hatina demsala zivistanê dê li Wanê û navçeyên dê ji ber şert û mercên giran ên avhewayê xwe gihandina dibistanan bi rêya servîsan zehmetir bibe û got:

“Ji ber vî yekê di serî de li navçeyên Şax, Elbak û Çaldêranê û gundan berî ku zivistan dest pê bike divê di servîsên dibistanan de ji bo ewlehiya canê xwendekaran gav bîr avêtin.

Li gundên navborî ji bo çareserkirina pîrsîrêkê heyî divê xebat bîr destpêkin.”

Rûdaw

Îro salvegera referandûma serxwebûna Kurdistanê ye

Îro salvegera referandûma Pêşmerge, di heyama 4 salên şerê li dijî DAIŞê de, Bexdayê hevkarîya hêza Pêşmergeyên Kurdistanê



Kurdistanê hat li dar xistin û ji sedî 92.73 kesên, ji bo serxwebûna Kurdistanê gotin 'Erê'.

Encûmena Bilind ya Referandûmê, di roja 07.06.2017an de hat pêkanîn. Piraniya partiyên siyasî yên Kurdistanê, li dora Serokê Herêma Kurdistanê yê wê demê Mesûd Barzanî civiyan û bi hev re ragihandin: "Dema wê ye gelê Kurdistanê biryarê li ser çarenivîsa xwe bide, ta bê zanîn serxwebûnê dixwaze, yan piştî wan hemû êş û azarên bi serê wî de hatiye dixwaze di çarçova Iraqê de bimîne."

Di civîna Encûmena Bilind de, roja 25. 09.2017an wek roja birêvebirina referandûmê hat diyarkirin û Komisyona Bilind a Serbixwe ya Hilbijartin û Rapirsînê dest bi amadekariyan kir, ji bo referandûmê bide encamdan.

Her çend e ji destpêka biryarê ve piraniya welatên navçe û cîhanê û berpirsên Hikûmeta Iraqê bawer nekirin Kurd pêngaveke bi vî awayî bavêjin jî, pirsra referandûmê bû dosya sereke ya medyaya navxwe ya Iraqê, navçe û cîhanê û wê biryarê her der hejand, ji ber ku di 100 salên borî de, karîna hilgirtina pêngaveke bi vî awayî ji Kurdistan re nehatibû pêş. Ji ber wê serkirdatiya Kurdistan bawer dikirin ku niha dema guncaw e û divê gel gotina dilê xwe bikin.

Iraq, welatên navçe û çend welatên din daxwaza derengxistina referandûmê kirin, lê Encûmena Bilind a Referandûmê bi wan daxwazan qayil nebû. Ji ber ku pirsgerêkên Herêmê bi Hikûmet û Dewleta Iraqê re gihîştibû lûtkeyê û wek Hikûmeta Herêma Kurdistanê û serkirdatiya siyasî ya Kurd digotin: "Baweriya Bexdayê bi hevbeşiyê nemaye û zêdetir ji 55 birge û bendên destûrê bînpê kirine, heger em nikarin du hevbeşên rasteqîn bin, em du cîranên baş bin çêtir e."

Li gor axaftinên berpirsên Hikûmeta Herêmê û Wezareta

nekiribû û heta rê li pêş gihîştina çek û keresteyên leşkerî yên civaka navdewletî ji Pêşmerge re dişand jî digirt. Ji destpêka sala 2014an ve û ji serdema ferdariya Nûrî Malîkî ve, Bexdayê budçeya Herêmê û mûçeyên karmendên Herêma Kurdistanê biribû, li ser yekalîkirina pirsgerêkên navçeyên Kurdistanê yên li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê de jî, tu pêşveçûnek nehat kirin. Dosya petrol û gaze jî wek xwe mabû, wê yekê jî serkirdatiya Kurdistanê û Hikûmeta Herêmê ji Bexdayê zêdetir bêhêvî kiribû. Berpirsên Bilind ên Herêma Kurdistanê amaje bi wê dikirin, dema Kurd bi daxwaza xwe di çarçova Iraqê de dijî û li gor destûrê xwedî mafê biryarê li ser çarenivîsa xwe bide ye, lê bînpêkirina mafên wî û pabendnebûna Bexdayê bi destûrê, wî mafî dide Kurdistan, bîr li bijardeyên de bike û li gel biryara xwe bide, çi dixwaze?

Referandûm ne diruşm bû, roj li dû rojê aheng û kernevalên berferê ji bo referandûma serxwebûnê li hundir û derveyî Kurdistanê hatin lidarxistin, lê hin aliyên nûnerên xwe di nava Encûmena Bilind a Referandûmê de hebûn, ne milê xwe dan ber bangeşeyê û ne wek dihat xwastin kar ji bo serxistina wê proseye kirin.

Mesûd Barzanî ku wê demê Serokê Herêma Kurdistanê bû, lê her xwe wek Pêşmergeyê rêya rizgarî û serxwebûna Kurdistanê dizanî û erkê giran bi rê ve dibir, rojane çendîn şandên navxweyî û derveyî dihatin ew didîtin û fişarên mezin dixistin ser wî, ta ji biryarê bi paş ve vekîşe, di heman demê de jî serkarwanê bangeşkarê referandûma Kurdistanê bû, ne tenê wê demê, heta di dawî hevdîtina wî berî referandûmê bi kenala "Al-Jazeera" a Qeterî re ku şeva 23. 09. 2017an hat belavkirin got: "Her riya im li ser wê yekê, ku mafê biryardanê û diyarkirina çarenivîsa xwe ji gelê me re heye."

Barzanî di gotarên bangeşeya referandûmê û di hevdîtinên medyayî yên navxweyî û derveyî de digot: "Referandûm mafê rewşa yê gelê Kurdistanê ye, mafê asayî, yasayî û destûrî yê gelê Kurdistanê ye. Bînpêkirina destûrê, lihevkerin, hevbeşiyê û birîna nanê gelê Kurdistanê han da gelê Kurdistanê ku referandûmê encam bide, heger destûr bihata bicîhkirin, Iraq nedigihîşt vê rojê."

Referandûm piştvanîyeke mezin ji aliyê Kurdên navxwe yê Herêma Kurdistanê, derveyî Kurdistanê û perçeyên din ên Kurdistanê sitend û aheng û kernevalên mezin hatin lidarxistin, çendîn korbend û civîn bi rê ve çûn û bo Kurdistan derfetek derbirîna li xwe û li mafên xwe wek derfetek dîrokî bû, lê Bexdayê lawaziya dewleta Iraqê bi sedema 4 salên şerê DAIŞê Kurd tohmetbar dikir û ev weke fersendekê dît bo bergiya referandûmê bigre, gefên mezin li gelê Kurdistanê dixwar, bi Îran û Tirkîyê re çendîn hevdîtin, civîn û rêkeftinên jêrbijêr kirin, gefa daxistina sînor û êrîşa leşkerî li ser Herêma Kurdistanê xwar, ta ji birêvebirina referandûmê poşman bibe, lê ji ber nebûna alternatîva referandûmê û nebûna gerentiyeke navdewletî ji bo diyarkirina demeke din û çareserkirina pirsgerêkên bi Bexdayê re nehat ber destê Kurd, Serok Barzanî piştî civîna bi Encûmena Bilind a Referandûmê re ragihand: "Referandûm nayê paşxistin û çawa dibe, bila bibe."

Sibeha roja 25. 09. 2017an, ji gelê Kurdistanê re wek cejnê bû, ew nû ji metirsiya DAIŞê derketibûn û bi hêviyeke mezin çûn ser sindoqan, ta bersiva wê bîrsê bidin, "Ma dixwazî serbixwe bibî, yan bi Iraqê re bimînin?" Lê nêzîkî ji sedî 93 ji nişteciyên Kurdistanê û navçeyên Kurdistanê yên li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê û Kurdên li derveyî Herêma Kurdistanê dengê "belê" dan serxwebûnê. Li gor nerîna çavdêrên navdewletî, referandûm li gor pîvanên navdewletî bi rê ve çû.

Lê fişarên û gefên li ser Herêma Kurdistanê zêdetir bûn, Iraq û welatên navçeyê artêşên xwe li sînorê Herêma Kurdistanê kom kirin û dest bi manorên leşkerî û xwenimayîşkirin kirin, gefa birçîbûnê xwarin û pişt re biryarên Parlamana Iraqê bi ser Herêma Kurdistanê de hatin sepandin û gelê Kurdistanê hat sizadan, geştala balafirxaneyên Herêmê hatin rawestandin û Bexdayê çendîn rênima li dijî gelê Kurdistanê girtin ber, lê serkirdatiya Kurdistanê neçû bin barê wan fişaran û amade nebû encamên referandûmê hilbiweşîne, tevî ku bi berdewam digotin, "Roja piştî referandûmê, dewletê ranagihînin."

PeyamaKurd

Nêçîrvan Barzanî: Karesata li Hemdaniyê rû daye ya me ye û em bi dil û can li gel wan in

Serokê Herêma Kurdistanê Nêçîrvan Barzanî serdana birîndarên bûyera şewata Hemdaniyê li Nexweşxaneyê Lezgîn a Hewlêrê



kir û ragihand, "Bûyera Hemdaniyê karesateke mirovî ya mezin bû, em hatine destxweşiyê li Wezareta Tenduristiyê ya Herêma Kurdistanê û Parêzgarê Hewlêrê bikin ku di destpêkê û demjimêra yekem a karesatê de ambûlans şandin."

Nêçîrvan Barzanî ragihand: "Ez spasiya xebatkarên tenduristiyê dikim, ji ber çavdêriya wan ji nexweşan re. Tiştê ku min bi çavên xwe dîtiye, cihê şanaziyê ye ji bo hemû gelê Herêma Kurdistanê."

Serokê Herêma Kurdistanê got: "Ev felaketeke mezin a mirovî ye. Divê em hemû li cem van xwişk û birayên xwe bin. Xwedê sebrê bide wan."

Herwiha got: "Ez îro bi Serokwezîrê Iraqê re axivîm. Ew ji ber vê bûyerê gelekî nîgeran e, wî yekser Wezîrê Navxwe şand Mûsilê û Wezîrê Tenduristiyê jî şand Herêma Kurdistanê. Min ji wî daxwaz kir ku di vê mijarê de lêkolîneke cidî bike û mexdûran qerebû bike."

Nêçîrvan Barzanî got jî: "Her çi pêwîst be em ê bikin û em ê di xizmeta we de bin, ew ezîzên me ne, karesata ku bi ser wan de hatiye, ya me û Herêma Kurdistanê ye."

Şeva borî di şewata hola şahiyên ya li qezaya Hemdaniyê ya li parêzgeha Neynewayê de, zêdeyî 100 kesî canê xwe ji dest dan û bi sedan kes jî birîndar bûn.

Piştî bûyerê, Serokwezîr Mesrûr Barzanî tîmên agirkuj û bijîjkî raspardin ku alîkariya birîndaran bikin û heta niha hejmarek birîndar bo nexweşxaneyên Herêma Kurdistanê hatine veguhestin.

Nerina Azad

Xoşnaw: Biryara Dadgeha Federal ne hiqûqî ye, siyasî ye

Parêzgarê Hewlêrê Omîd Xoşnaw li ser biryara Dadgeha Federal a Iraqê ya hilweşandina meclîsê bajarên Herêma Kurdistanê bertek nîşan da.



Omîd Xoşnaw di merasîma vekirina dibistanê li Hewlêrê de, ji rojnamevanan re got: "Ji biryara Dadgeha Federal a Iraqê eşkere tê fêmkirin ku wekî biryarên berê ev biryar jî siyasî ye, ne hiqûqî ye."

Xoşnaw diyar kir ku ew ê li benda helwesta aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê û hikûmeta Iraqê bin û li gor wê nêzîkatîyê li biryarê bikin. Serok Meclîsa bajêr ê Hewlêrê Elî Reşîd jî piştî biryara dadgeha federalî ragihandiye ku ew dê xebatên xwe bidin rawestandin û ligel komîsyona hiqûqê rewşê bişopînin.

PeyamaKurd

Serok Barzanî bi şanda bilind a Tevgera Aşûrî re civiya

Serok Mesûd Barzanî îro 28ê Îlonê, pêşwazî li şandeke bilind a Tevgera Demokrat a Aşûrî ya bi Serokayetiya Sekreterê Partiyê Ye'qûb Gurgîs



kir. Piştî civînê hate ragihandin, ri vê hevdişînê de her du alî hevxiyê xwe ya kûr ji bo kesûkarên qurbanîyên rûdana diltezîn a şewata hola dawetê ya qezaya Hemdaniye ragihand ku tê de sedan welatiyan can dane û birîndar bûne.

Di civînê de, rewşa siyasî ya Iraq û Herêma Kurdistanê, kûrtirkirina bingehên pêkvejiyan û aramiyê û her wiha peywendiyê dualî yên di navbera her du alîyan de hatin guftûgokirin.

Herwiha Serok Barzanî ji bilî pîrozbahiya bi boneya hilbijartina Ye'qûb Gurgîs wekî Sekreterê Partiyê, ji bo Tevgera Demokrat a Aşûrî, hêviya serkeftinê di kar û çalakiyên wan yên siyasî de xwest.

PeyamaKurd

Îro salvegera Referandûma Serxwebûna Kurdistanê ye: Mesrûr Barzanî peyam da

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di salvegera Referandûma Serxwebûna Kurdistanê de peyamek weşand.



Serokwezîr Barzanî da zanîn ku "Îro sembola serkeftina îradeya miletekî ye."

Referandûma Serxwebûna Kurdistanê

Îro 6emîn salvegera Referandûma Serxwebûna Kurdistanê ye.

Referandûma Serxwebûna Kurdistanê 25ê Îlona 2017an hat lidarxistin.

Xelkê Herêma Kurdistanê û navçeyên Kurdistanê yên li derveyî îdareya Herêma Kurdistanê bi rêjeya Ji sedî 93 piştigirî da serxwebûna Başûrê Kurdistanê.

Pêvajoya Referandûmê

Roja 7ê Hezîrana 2017an li bajarokê Pîrmamê yê Hewlêrê, bi serokatiya Serok Barzanî bi aliyên siyasî yên Herêma Kurdistanê re civînek hat lidarxistin.

Di vî civînê de roja 25ê Îlona 2017an wekî roja sazkirina referanduma serxwebûna Başûrê Kurdistanê hat diyarkirin.

Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK), Yekîtiya Niştîmaniya Kurdistanê (YNK), Partiya Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê (Yekgirtû), Bizava Îslamî ya Kurdistanê (Bizutnewe), Partiya Komunîst a Kurdistanê, Partiya Sosyalîst Demokrat a Kurdistanê (PSDK), Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê, Partiya Rêncder û Zehmetkêşên Kurdistanê, Partiya Pêşveçûn û Çak-saziyê ya Kurdistanê, Lîsteya Tirkmen a Hewlêrê, Eniya Tirkmenên Iraqê (ITC), Partiya Geşepêdana Tirkmenî, Lîsteya Ermenî ya Parlamentoya Kurdistanê, Tevgera Civaka Demokratîk a Asûrî û Meclîsa Asûrî û Keldanî beşdarî vî civînê bûn. Hikûmeta Navendî ya Iraqê û welatên cîran li dijî biryara referandûmê derketin. Li aliyê din, hemû Kurdên cîhanê piştigirî da Referandûma Serxwebûna Kurdistanê. 400 çavdêrên biyanî û 2 hezar çavdêrên xwecihî di pêvajoya referandûmê de amade bûn.

Herwiha 159 dezgehên ragihandinê yên biyanî û 500 dezgehên ragihandinê yên herêmî ji nêz ve pêvajoyê şopand.

rojvakurd.com

Kurd divê ji encama Refêrandûma Kurdistanê re xwedî derkevin

Di Dewleta Federe ya Kurdistanê de Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê beriya 6 salana di 25ê Îlona 2017an de hat li darxistin. Kurdistanîyan di refêrandûmê de ji serxwebûna Kurdistanê û dewletbûnê re bi dengê bilind û zêde gotin "erê". Piştî encamdana referandûma serxwebûna Kurdistanê Li Ropjhelatê Navîn gelek buyêrên girîng rû dan.

PÊVAJOYA REFÊRANDÛMA SERXWEBÛNA KURDISTANÊ...


Rejîma faşist û nîjadperest ya Baasê di sala 2003-an de encama têkoşîna neteweyî ya Kurdistanê û operasyona Emerîka û hevpeymanê wê hat rûxandin. Hemû dezgehên dewletê û bi taybetî jî aparatên dewletê yên milîter ji holê rabûn. Jinûve dewletek ava kirin kete rojeve Kurdan û Ereban û kêmnîeteweyên din û cemaatên olî û mezhebi.

Encama rûxandina Rejîma Baasê biryar hat dayin ku dewletek hevbeş ya Kurdan û ereban û kêmnîeteweyên din ava bibe. Ew dewlet jî diviya bû ku bibe dewleta federal. Di sala 2005an de bi refêrandûmê makezagonek qebûl hat pejirandin û di makezagonê biryar hat dayin ku dewleteke demokratîk ya federal ava bibe. Statuya Kerkukê jî di sala 2007an de bi refêrandûmê tespit bibe.

Hezar mixabin ji bona k udi ereban de çandê demokratîk nebû, dewleta federal meşandin gelek zehmet bû. Makezagona federal bi her awayî bînpê dibû. Loma jî serokatiya Kurdistanê ji bona ku ev pîrgirêke ji holê rabe, modela dewleta konfederal pêwîst dît. Loma jî diviya bû ku dewleta Kurdistanê ava bibe. Ji bona vî jî biryara Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê bihata lidarxistin.

Refêrandûm Serxwebûna Kurdistanê di gelek qonaxên dijwar re derbas bu. Biryara refêrandûmê girtin, gelek zehmet bû û di demeke dirêj de hat wergirtin. Lewra li Kurdistanê nekokiyan siyasî û partîyan zêde bûn. Midaxelayên dewletên kolonyalîst û bi taybetî jî bandora Dewleta Îslamî ya Kolonyalîst a Îranê zêdetir bû li ser partîyên Kurdistanê. Îranê nedixwest ku li Kurdistanê Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê çê bibe. Îranê baş dizanî ku Dewleta Serbixwe ya Kurdistanê dê bandor û desthilatdariya wê li Iraqê sînor bike. Dê li Ropjhelatê Kurdistanê jî bibe modelekê û ew jî dê ji bona Dewleta Kolonyalîst ya Îranê bibûya xeter.

Ji derbeyî PDKê hemû partî li dijî refêrandûmê bûn. Lê dîsa jî Serokê Kurdistanê bi qerardarî xebata xwe di derbarê Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê de meşand. Ev biryara ji bona YNKê



İbrahim GÜÇLÜ

gelek girîng bû û lewra biryara Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî li ser gel tesîreke mezin nîşan da. YNKê, damezrênera Dewleta Federe ya da Kurdistanê bû. Loma jî ji derveyî biryara Serokê Kurdistanê tevgerandina YNKê, dê zirereke mezin bida YNKê û din av gel de jî ew dê bê qiymet bikira.

Lewma YNKê jî mecbur bû ku biryara Serokê Kurdistanê di derbarê Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê de bipejirîne. Piştî biryara YNKê, ji derveyî Komala Îslamî û GORANê hemû partî û dezgehên Kurdistanê ji referandûma serxwebûna Kurdistanê re "erê" gotin.

Di 7ê Hezîrana 2017an de biryar hat girtin ku referanduma serxwebûna Kurdistanê çê bibe.

Piştî ve qonaxê jî, ji bona ku Serokê Kurdistanê û Serokatiya Kurdistanê dev ji refêrandûmê berde û biryara xwe paşve bigrin, di hûndir hewildaneke xurt û êrişkeriyekê dest pê kir. Lê qerardariya serokatiya Kurdistanê pêşîya paşve gav avêtinê girt.

Ew jî nebû, dewletên mezin Emerîka, Engilîstan û.w.d ketin rojevê û ji bona ku refêrandûm paşve bê xistin hewildaneke xurt dest pê kir. Serokê Kurdistanê û serokatiya Kurdistanê li hemberî ve daxwazê pêşniyarên xwe yên strateji pêşkêş kirin. Lê ew pêşniyarên wan nehatin pejirandin. Serokê Kurdistanê û serokatiya Kurdistanê jî paşve gav neavêtin.

Goran û Komelaya Îslamî ya Kurdistanê jî mecbûr bûn ku di dawî de piştigiriya refêrandûmê bikin.

Di 25ê Îlona 2017an de Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê hat lidarxistin.

Heman şev bi giştî encam derketin holê ku Kurdistanîyan ji serxwebûna û Dewleta Kurdistanê re "erê" gotine.

Piştî du rojan jî encama fermî diyar bû ku Kurdistanîyan ji sedî 93-yan ji dewleta Kurdistanê re gotine "erê".

Di şertên ne asayî de beşdarî ji gelek baş bû. Ji sedî 73-ê bû.

ENCAMÊN REFERANDÛMÊ PÎROZ Û GİRİNG BÛN. LI KUR-

DISTANE ŞOREŞEKE SIVIL Û MİLÎ Û DEMOKRAT A GEL QEWMÎ BÛ...

Encama referandûma serxwebûna Kurdistanê pîroz bû. Dîrokî û civakî û girîng bû. Divê ev encaman baş bîn analîz kirin û şîrove kirin.

Divê em bi serbilindî diyar bikin ku li Kurdistanê miletê kurd û tevayî Kurdistanîyan Şoreşeke Sivil û Milî û Demokrat ve Gel pêk anîn. Ev şoreşa li dinyayê jî dê bibûya modeleke nû.

Encama ve şoreşê li Kurdistanê miladeke nû dest pê kir. Kurdistanîyan di ser 200 salî re bazdan û hatin qonaxêke nû.

Piştî referandûmê, gelek xwezayî bû gûhertin û refaormên esasî ji bona kesan, dezgehên dewletê, berpirsiyarên Kurdistanê û partîyên siyasî ketin rojevê. Kes, berpirsiyar, dezgeh û partîyên ku di xwe de gûhertin nekin, nikarin di dema nû de li ser piyan bisekînin.

Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê diyar kir ku Serokê Kurdistanê û Hikûmeta Kurdistanê û Partîyên Kurdistanê û Tevayî Berpirsiyarên Kurdistanê xebatek baş û heja û bi plan meşandibûn.

Encama referandûmê derxist holê ku Meclîsa Bilind ya Referandûmê gelek teknîkî û elektronîkî kar kiriye. Loma jî di demek kurt de encamên referandûmê bi fermî û şeffaf hatin diyar kirin.

Referandûma Serxwebûna Kurdistanê yekîtiya kurdistanîyan û miletê kurd pêk anî. Divê ew yekîtiya bi awayekî demokratîk bihata domandin.

Encama referandûmê derxist holê kurdistan welatekî gelek aram e. Loma jî li Kurdistanê di şertên gelek dijwar de dengdanê de hîç bûyereke û pevçûnek pêk nehat. Ev yeka jî, serkeftina parastin û hêzên ewlekariyê diyar kir.

Piştî referandûmê arambûna Kurdistanê girîngtir bû.

Encama serxwebûna Kurdistanê derxist holê kurdistanî Dewleta Kurdistanê dixwazin.

Ew dewleta jî divê dewleta hemû kurdistanîyan be. Ne bes dewleta kurdan be.

Dewlet, demokrat û federalî û parlementerî be.

Hezar mixabin encama êrişê Hikûmeta Navendî û tifaqkarên wan dewletên kolonyalist û rêxistinên terorîst yên wek PKK û Haşdî Şabî, Xiyaneta Beşek YNKê û Goranê encama Refêrandûma Serxwebûna Kurdistanê cîbicî nebû û Kerkuk hat îşgal kirin.

Lê dîsa jî encama refêrandûmê rojane û girîng û pêşeroja Kurdistan û Kurdistanîyan e. Divê hemû kurd û Kurdistanî ji encama referandûmê re xwedî derkevin.

Tetwan, 26. 09. 2023

Tirej Niştiman

Rewşa kesên ku bi asîmîlekirina cewherê cewherê xwe teşe dikin, cuda ye. Mirovê ku ji her tiştê ku têdikoşe û asîmîle dike jî kêr e. Herîrî yek ji van mirovên kêr bû.

Elî Herîrî (Elîyê Herîrî) yek ji du helbestvanên mezin ên klasîk ên kurd e. Yê din Baba Tâhir-i Uryân e. Ji ber windabûna berhemên Herîrî mijake nenasbûnê heye. Dema ku hezkirina gel a ji Herîrî û bîranîna Ehmedê Xanî re bi vî mijdara tarîtiyê re dibe yek, meraqa li hember Herîrî zêdetir dibe. Dîrok, xwîn û agir di her kêliyê de helbestvanekî mezin dixwe. Lê keramet çi dibe bila bibe, ruhê wî yê geş li Kurdistanê digere. Tiştê ku ez ê niha vebêjim çîroka vî ruhî ye ku heya roja îro hatiye.

Di sala 1009an de li gundê Herîrî yê Colemêrgê ji dayik bûye. Ev tarîx hevdem e bi serdema herî mezin a fermana Merwanîyan ku ji aliyê şivanekî serhildêr ve hatiye damezrandin û destpêka serdema Nasruddevle Ehmed. Ev serdemek e ku li gelek deveran bi taybetî li Amed, Meyafarîkin, Nisêbîn, Ahlat, Erzen, Cizîra Botanê, li mizgeftan pirtûkxane hatin vekirin, medrese hatin vekirin, helbesta kurdî ya nivîskî pêş ket û hewl hat dayîn ku li gel belav bibe. Serdemekê çandî ye ku tê de zanyar, dîroknas û helbestvanên bi eslê xwe Erebb û Kurd derketine, wek İbn'ul Esir, Abdullah el-Kazaruni û et-Thami. Çand bi dilê xwe mirovan dişopîne, digere nava xwe, dor lê digre, şêkil dide wî û bi mirovên ku şêkil dide çêdibe. Ma hûn ê çi bikin, tenê ew e. Hunermend pêşî ji xwe, piştê ji şert û mercên derdora xwe tê dinê.

Rewşa kesên ku bi asîmîlekirina cewherê cewherê xwe teşe dikin, cuda ye. Mirovê ku ji her tiştê ku têdikoşe û asîmîle dike jî kêr e. Herîrî yek ji van mirovên kêr bû. Bi du hestên xurt, êş û tenêtiyê dest bi jiyana kir. Dema bavê wî wefat kir, mamê wî dest bi lînerîna wî kir, pîşeya wî hînî wî kir û ew şand medreseya kurdî, paşê şand Şamê û ji wir jî şand Bexdayê da ku xwendina xwe

kûr bike. Mamê ku biraziyê xwe şandibû navendên çandî yê giran ên serdemê. Di van navendan de beşdarî sohbetên kesayetiyên çandî yê navdar ên wekî Şêx Ebû Elî Megrîbî bû û ji wan bandor bû. Di vî heyamê de dest bi nivîsandina helbestan jî kiriye. Wî bi zaravayê Kurmancî yê Kurdî, bi paşnavên Elî, Eliyo, Şêx Elî nivîsandiye.

Yek ji taybetmendiyên herî xweş ên Herîrî ew bû ku xwe ji çandên cuda re vekiribû û li cihekî nedima. Li erdnî-



gariyê fireh ku şaristaniyên Babîl, Asûrî, Med, Faris, Emewîyan û Ebasiyan tê de bi hev ve girêdayî bûn, bi gerok jiya. Lê çanda xwe ya resen ji bajarên bazirganî û çandî yê wekî Cizîr, Hewlêr, Bexda û Mûsilê wergirtiye. Ew bi piranî li van deran beşdarî sohbetên zanyar û helbestvanan bû û hêdî hêdî di nav xelka xwe de wek helbestvanekî bi edet û ecêb, mirovekî jîr, vekirî û bi rûmet hat naskirin.

Herîrî helbestvanek e ku helbesta xwe mîna şerabê di bodruma hestan de çêdike. Piştî Baba Tâhir-i Uryan dîwan-nivîsê Kurd ê duyemîn ê naskirî ye. Em dikarin wî zimannas û dîwannivîsek jî bi nav bikin. Lê mixabin ji dîwana wî tenê çend helbest mane heta îro. Nizanim çima, ez bi xwestekê bêsînor her

dîwaneke kevnar a windabûyî bixwînim. Ku di vî dîwanê de cewher û forma olî ya biyanîbûna helbestvan ji xwe re kifş bike; Di rastiye de, ne tenê ew, di heman demê de ji bo kifşkirina helbestvanê biyanîbûyî yê ku ji biyanîbûna helbestvan ji jiyana ku di hunera wî de bi tevayî nefes digire, derdikeve holê; Lê ne bi awayekî rûsayî, bi hemû taybetmendî û nexweşiyên xwe yê bingehîn ve wê kifş bike. Ev ji bo min derbasbûneke baş e.

Heger Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de, şeş sedsalan piştî Herîrî, behsa wî nekiriba, dê bala wî nebaya û dê pir paşê bihata kifşkirin.

Margarita Borisavna Rudenko, hin destnîvîsên Herîrî li St. Ew dibêje ku ew li Pirtûkxaneya Shaltikov-Schedrin li St.

Kurdê ku rastiya xwe derxistiye holê divê bikeve wir. Bi dîtina min Ehmedê Xanî teqez dîwana Herîrî xwendiyê. Heger wî nexwendibûya, wî wek yek ji helbestvanên mezin ên klasîk ên kurd ku jê hez dikir, binav nedikir.

Ji ber ku Herîrî di nav gel de geriyaye û edebiyata devkî ya kurdî baş dizanibû, helbesta xwe bi zimaneke ku gel jê têdigi-hîje, çêkiriye. Hem bi evîna mîstîk û hem jî bi evîna dinyayî re mijûl dibû. Ji ber vî zelaliya ziman û ji ber ku girîngiyek taybet dida mijarên heqîqet û heqîqetê, helbestên wî bi sedsalan di nav gel û medreseyan de dihatin xwendin. Helbet yek ji sedemên vî xwendina berbelav jî zerafeta folklorî ya helbestan e. Xelk wî wek alimekî ku ji cîhana nehênîyan peyvên efsûnî, xweş dibihîse û di hişê xwe de tomar dike dizane. Mirov ji bo kesên ku dixwîne lê ne mîr in hevoka "Xwende û bûye Eliyê Herîrî" wek zargotinekê bi kar tîne û helbesteke ku lê guhdarî dike û jê hez dike wek "Tama Eliyê Herîrî" bi nav dike.

Tê gotin ku ew di sala 1080'an de li Colemêrgê jiyan xwe ji dest daye, dema ku şaristaniya Merwanîyan li dijî leşkerên Selçûqîyan hewl dida bijî. Kes nizane ka dîwana helbestvan çi bûye, ka ew xwe spartiyê bîra xelkê yan jî ketiyê zengila şûr û agirê leşkerên Selçûqîyan. Aram Mahir Taha

Ji Konsûla Brîtanyayê serdana xatirxwestinê bo Serok Barzanî

Serok Mesûd Barzanî îro 25ê Îlonê pêşwazî li Konsula Giştî ya Brîtanya ya Hewlêrê Rosy



Cave kir. Hate ragihandin, di hevdîtina ku Konsula Giştî ya Brîtanya li Hewlêrê ji ber bidawîhatina erkê xwe û xatirxwestinê serdana Serok Barzanî kiriye de, kêfxweşiya xwe ya ji bo karkirina li Herêma Kurdistanê nîşan da.

Serok Barzanî jî ji bilî destxweşiyê, hêviya serkeftinê di erkê nû de ji Rosy Cave re xwest.

Herwiha herdu aliyên tekezî li ser dostanî û pêşxistina pêwendiyên di navbera Herêma Kurdistanê û Brîtanya de kirin. **PeyamaKurd**

Bafil Talebanî: Em dê li Kurdistanê yekîti û azadiyê biparêzin

Serokê YNKyê Bafil Talebanî got, "Em dê li Kurdistanê yekîti û azadiyê biparêzin, YNK destê aşî û biratiyê dide her kesî."



Îro li Silêmaniyê Kongreya Pêncemîn a Yekîtiya Niştimaniya Kurdistanê (YNK) tê lidarxistin. Serokê YNKyê Bafil Talebanî di kongreyê de anî ziman ku divê pêwendiyên xwe yê bi hêzên Kurdan û Îraqê re bi hêz bikin.

"Ez we tenê nahêlim"

Bafil Talebanî amaje bi hilbijartinên Herêma Kurdistanê kir û got:

"Li pêşiya me du hilbijartin û kongreyek heye. Ev yek, hêza KYByê nîşan dide. Em ji hev bawer dikin, divê em gelê xwe li hev binin. Divê em amade bin ku ji bo gelê xwe fedakariyan bikin. Xebatên YNKyê nû dest pê dijin, divê em piştê hevdû bigirin. Hûn çi kar û erkî jî bidin min ez we tenê nahêlim."

Serokê YNKyê destnîşan kir ku divê Kurd pêwendiyên xwe yê Şiyan re xurt bikin û pê de çû: "Divê em hevkarîya stratejîk a di navbera Kurdan û Şiyan de pêş bixin. Divê em bi hev re li miletê xwe xwedî derkevin û divê em ji bo azadî demokrastiyê têbikoşin."

"Em dê li Kurdistanê yekîti û azadiyê biparêzin" Serokê YNKyê Bafil Talebanî got di axaftina xwe de qala behsa girîngiya ciwanan kir: "Rast e petrola me heye, gaza me heye lê tiştê ku dê me dewlemend bike ew ciwanên me ne ku wekî stêrkan dibiriqin û xizmeteke baş wernagirin."

Dubare dibêjim: Em ê ji gelê xwe re xizmetê bikin, em dê ewlehiya gelê xwe biparêzin. Em dê li Kurdistanê yekîti û azadiyê biparêzin. Em YNK ne, em partiya têkoşer û şehîdan in, em partiya qehremanan in, em partiya wan kesan in ku dîktatorî hilweşandiye." **Nerina Azad**

Mezlûm Ebdî: Em dixwazin bi awayekî yasayî bibin beşek ji hêza berevaniya Sûriyê...



Fermendarê Giştî yê HSDê Mezlûm Ebdî hevpeyvînek da weşana "El-Mecla" û li ser aloziyên li Dêrazorê ragihand, rewş aram bûye alozî jî bidawî bûye.

Ebdî herwiha got ku heger krîza Sûriyê bê çareserîkirin, ew wek HSD dixwazin bi awayekî yasayî bibin beşek ji sîstema berevaniyê ya Sûriyê.

Fermendarê HSDê bal kişand ser ku di aloziyên Dêrazorê de tiliya Tehran û Şamê hebûyê û da zanîn, Tirkîye jî bi piştgiriya komên çekdar ên

Sûrî ket ser vî xetê, lê ew her sê welat bi ser neketin û niha rewşa Dêrazorê aram bûye.

Ebdî diyar kir, "Aloziya dawî li 5 gundên rojhilatê Dêrezorê rû da. Lê rewş aram bûye, û em hewl didin ku daxwazên xelkê bi cih binin û pirs-girêkên wan çareser bikin."

Mezlûm Ebdî da zanîn, Rûsyayê komên çekdar ên ku "hewl didin xwe weke eşîran nîşan bidin" bombabaran kir û destnîşan kir, Rûsya bi formula bikaranîna rewşê ji bo operasyonên nû yê Tirkîyê razî nabe.

Herwiha Ebdî di hevpeyvînek de daye xuyakirin, "Amerîka beşdarî operasyonên leşkerî yê li dijî eşîran nebû, ji ber ku di pêvajoya pêkanîna aramiyê de, ji derveyî piştgiriya esmanî, pêwîstiya me bi piştgiriya Amerîka nîne."

Fermendarê HSDê got, ew çûna Şamê ji bo danûstandinan red nake û got: "Lê belê heta niha şert û mercên wê yekê çênebûne û me ti nîşaneke çareseriyê ji Şamê nedîtiye."

Ebdî got: "Me ji Rûsyayê daxwaz kir ku alîkariyê bike, ta ku em bigihin çareseriyê siyasî ku dawî li krîza Sûriyê ya mezin bîne. Em ji Şamê jî dixwazin ku çareseriyê siyasî ya realîst qebûl bike. Lê Şam hîn jî li ser siyaseta xwe ya redkirinê rîj e û her pêşniyarên realîst ên ku krîzê bi dawî bike û bibe alîkar ji bo peydabûna aşî û aramiyê, red dike."

Mezlûm Ebdî eşkere kir: "HSD hêzeke pîşeyî û niştimanî ye, em daxwaz dikin ku ew bibe beşek ji sîstema berevaniyê ya Sûriyê û piştê rol û karê wê bi yasayekê were birêxistin."

Ebdî herwiha tekez kir, her axaftinek li ser hilweşandina HSDê bê kirin, dê ji bo astengkirina her çareseriyê siyasî ya muhtemel be û dê ti cidiyeta diyalogê nîşan nede. **PeyamaKurd**

Mesrûr Barzanî li ser bûyera li Hemdaniyeyê: Em ji bo alîkariyê amade ne

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê li ser bûyera li Hemdaniyeyê peyamek belav kir û ragihand, "Em gelekî xembar bûn û ji bo her cure alîkariyê em amade ne."



Şeva borî, li qezaya Hemdaniyeyê ya parêzgeha Nînowayê ya Îraqê li hولة dawetê şewat derket.

Alîkarê Rêveberê Tenduristiyê yê Nînowayê Dr. Ehmed Duberdanî ji Rûdawê re ragihand ku herî kêm 113 mirî û bi sedan birîndar hene.

Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî li ser bûyera şewatê peyamek belav kir û anî ziman:

"Ez xwe şîrikê xema wan dizanim. Xwedê wan bi bihuştê şad bike. Ji birîndaran re şîfayê dixwazim."

Duh bi gihîştina xebera şewatê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, Wezareta Tenduristiyê û hemû aliyên pêwendîdar ên Hikûmeta Herêma Kurdistanê erkdar kir ku alîkariya qurbanîyan bikin.

Şahidên bûyerê diyar kir ku di dema dansa bûk û zave de fişekên hewayî hatin pêxistin û agir bi carekê de bi panelan ket. Berpirsan li ser bûyera trajîk dest bi lêkolînan kirine.

Rûdaw

Referandûm guhertineke erênî ya dîrokê ye



Dr. Salar Osman

